RÊTINA ÇEHREKÊ

Aşopên xirş
Xwe li bejna ayindekê reşîn dialand
Piştî borîn ji hêla sor hêvî qinare
dibûn…
û
Portrêta te namû xuya dikir.
Bi normalî peyv li ser ezmanê te
dipeşîn…
û
xwe bi perdeyên guhê min ve nûsandin
Bi çeng diçûne jor
her li ser êk û du ya xwe yî
Bes e, ne
Agir…? Bila
Şehrezayî …niza
Qeder hezkirinek e
û
bêyî silav dibite mêvan
Bizane…
Ez û tu
Êk in li maçkirina xewn û mirinê.

Hemo Mihemed